
# Kurtasîyek li ser **mafên nexweşan**

**Nexweşên ku baş li ser mafên xwe agahdar bin, dikarin bi şêweyekî baştir û çalaktir tevlî wan çarserîyên tendirustî yên tên pêşnîyarkirin bibin û peywendîyeke baş û bawerpêkirî bi doktor û berdestîyên wan re ava bikin.**



KURDÎ / KURDISCH / KURDE

## 1. Mafê şirovekirinê

Ji mafê te ye ku tu bi rengekî zelal û kuncav li ser rewşa xwe ya tendirustî û pişkinînên siberojê û çareserîyan, mifayên çaverêkirî û metirsîyên dîyar û pêşbînîyê û herwiha li ser alîyên darayî jî werî agahdarkirin.

Dema tu derbasî sazîyeke tendirustîyê dibî, dê agahdarîyan bi şêweyê kaxez yan bi şêweyê elektronî li ser maf û erkên te û herwiha li ser şert û mercên mana te di wê sazîyê de wergirî.

## 2. Razamendîya azad û şirovekirî

Li dema hebûna hêza standina birîyarê (eger tu bikarî rewşekê fam bikî û li ser bingeha wê biryareke dirust bidî) bi tenê çareserî dikare di wê rewşê de bê encamdan, eger tu – tu mezin bî yan biçûk bî – bi azadîya xwe û piştî şirovekirinê (piştî tu bi giştî tevahîya rewşê baş fahm bikî) wê qebûl bikî.

## 3. Wesîyetnameya nexweşan û nûneratîya li dema nemana hêza standina biryarê

Tu dikarî wesîyetnameyekê binivîsî û tê de destnîşan bikî, ka tu dixwazî kîjan dermankirinên bijîşkî qebûl bikî û kîjanan qebûl nekî û nûnerekî ji bo wê yekê bi nav bikî, daku heke hat û te hêza standina biryarê ji dest da, ew li şûna te biryaran bide. Ew kes dikare êdî ji bo te (anku li gorî daxwazîya te ya texmînkirî û her wiha li gorî berjewendîyên te) biryarê li ser dermankirina te bide, eger tu nema karibî bixwe biryarê bidî.

## 4. Hilbijartina azad ya kesê pisporê yê/a tendirustîyê û/yan sazîya tendirustîyê

Gelo tu dikarî kesê/a pisporê/a tendirustîyê yan sazîya tendirustîyê yê/a bi dilê xwe hilbijêrî yan na, ev mijar bi şêweyekî bingehîn bi wê modêla sîgorta te ya tendirustîyê ve girêdayîye. Dibe ku sîgorta te ya bingehîn xwe nede ber hemû mesrefên dermankirina li nexweşxaneyeke taybet yan li dervey Kantonê. Ji ber vê yekê gelek giring e ku tu bi her hal wan şert û mercên girêbesta sîgorta xwe ya bingehîn û sîgorta zêde baş bixwînî.

Eger ew modêla sîgortê ya te ji bo xwe hilbijartî, azadîya hilbijartina pisporê/a tendirustîyê sînordar neke (wek nimûne modêleke dixtorê malbatê yan toreke çavdêrîyê), wî çaxî li dema dermankirina bê razana li nexweşxanê tu dikarî bi dilê xwe hilbijêrî, ka tu dixwazî li ba kîjan kesa/ê pispora/ê tendirustîyê werî dermankirin.

Ew katalog û başîya wan xizmetan yên sîgorta bingehîn misogir xwe dide ber wan, wekî xwe dimînin.

## 5. Tedbîrên zordarî

Her dermankirinek li dijî daxwazîya te yan sererayî dijayetîkirina te, wek tedbîreke zordarî tê hisabkirin û hîç ferq nake, ku ew tedbîreke sînordar be yan dermankirineke bê razîbûn be.

Divê tu di rewşeke wisa baş de bî ku tu bikarî wê dermankirina ku ji bo te tê pêşnyarkirin, qebûl bikî; anku li ser bingeha agahîyên pêbawer û piştî nirxandineke hûr û kûr. Divê ew tedbîr li gorî nirxên te yên şexsî bin.

Bi giştî wisa ye, ku her şêweyekî bikaranîna zordarîyê qedexe ye; lê belê hindek caran di warê tendirustî de hindek rewşên awarte hene, ku tê de ji bilî bi kar anîna tedbîrên zordarîyê çareke din nîne (wek nimûne di nexweşxaneyeke nexweşîyên derûnî de). Lê belê ji bo vê yekê jî şert û mercên dijwar hene, ku li gorî yasayê hatine sazkirin.

## 6. Nehênîya pîşeyî di warê tendirustîyê de

Ji mafê te ye ku bi nehênî û pêbawerî danûstandin li gel agahîyên te were kirin. Ew pisporên tendirustîyê pabend in bi nehênîya pîşeyî ku wek nehênîya dixtoran jî tê binavkirin. Ew hemû tiştên ku li dema karê xwe li ser nexweşan dibihîzin, divê ji bo xwe bihêlin.

Ji bilî hindek rewşên yasayî yên awarte, çênabe ew bê razîbûna te hîç agahîyeke te bidin kesên din. Ew nehênîya pîşeyî di navbera pisporên tendirustîyê jî de misogir e.

Armanc ji nehênîya pîşeyî parastina jîyana te ya taybet e û parastina kesên pispor e, ku mecbûrin wan tiştên bo wan hatine gotin, ji bo xwe bihêlin û nebêjin kesekî din

## 7. Mafê dîtina dosya nexweşan

Te maf heye, ku tu dosya xwe ya nexweşîyê bibînî û bihêlî ku naveroka wê ji bo te were şirovekirin. Li gorî Kantonê tu dikarî daxwaza belgeyên eslî yan kopîyekê jê bikî û bidî wî/wê pisporê/a tendirustîyê ya te bo xwe hilbijartî.

## 8. eHealth dosya elektronî ya nexweşan

Te mafê hebûna dosyeke elektronî ya nexweşan heye (EPD). Tu bi vî awayî dikarî bi şêweyekî çalak tevlî birêvebirina datayên xwe yên tendirustî bibî û agahîyên xwe yên tendirustî bi awayê dicîtal werbigirî.



Dosya elektronî ya nexweşan (EPD) kopîyên dicîtal yên datayên te yên herî giring kom dike, ewên li cem sazîyên xizmetguzarîyên tendirustî yên taybet bi te hatine tomarkirin. Armanca wê hêsankirina danûstandina di navbera pisporên tendirustîyê û dana birîyareke hevbeş e. Çawa te maf heye, her wisa pisporên tendirustîyê, yên te derman dikin, maf heye her demeke hebe wan agahîyan bibînin. Dosya te ya nexweşîyê ya elektronî (EPD) bi rengekî parastî tomarkirî ye. Ew milkê te ye û tu bi azadî birîyarê li ser didî, ka kî dikare wê bibîne û kî nikare.

## 9. Çewtîyên dermankirinê

Te maf heye, ku tu li gorî guhdana tendirustî ya pêdivî werî dermankirin. Dema ku çewtîyek di warê dermankirinê de çêbe, ji mafê te ye ku tu ji wê/wî kesa/ê pispor, ya/ê tu dermankirî daxwaza dane şirovekirinê bikî. Tu dikarî hemû pirsan bikî, daku tu fam bikî, ka çi çêbûye. Herwiha te maf heye ku tu dîtina dixtoreke/î din jî werbigirî û ji bo alîkarîya berfirehtir daxwazê ji rêkxistineke mafê nexweşan bikî.

Metirsîya sifir di warê tendirustîyê de nîne; her coryeke dermankirina bijîşkî metirsîyên wê hene. Dema ku piştî dermankirinê hindek pirsgirêk peyda bibin, ev tişt yekser nayê wê wateyê ku pisporê/a tendirustîyê şaşîtîyek kirîye û mirov dikare wî/wê bike berpirsê wê şaşîtîyê.

## 10. Mafê hebûna alîkarî û şêwirmendîyê

Li dema tevahîya mana li sazîyeke tendirustîyê te mafê wergirtina piştevanîyê heye. Te maf heye, ku bihêlî kes û karên te û malbata te alîkarîya te bikin û tu danûstandinê bi derdora xwe re bikî. Herwiha tu dikarî daxwaza piştevanîyê ji keseke/î din ya/yê bîyanî jî bikî, wek nimûne ji rêkxistineke nexweşan.

Eger tu li malê werî dermankirin, wî çaxî tu dikarî bihêlî ku keseke/î nêzîkî te, piştevanîya te bike û li ber serê te be. Ew kes dikare bi berdewamî di jîyana te ya rojane de alîkarîya te bike.

## 11. Bexşandina endam û şaneyên laş

Hê tu zindî mafê te heye birîyarê bidî, ka tu dixwazî endamên laşê xwe ji bo çandinekê bibexşînî yan na.

Bi kêmanî heta sala 2026an ew çareya razîbûnê misogir e, ev tê wê wateyê: Mirov dikare endam û şaneyên laşê keseke/î mirî tenê hingî jê bibe, eger wê/wî yan mirovên wê/wî ev tişt qebûlkiribin. Tê çaverêkirin, ku ji sala 2026an û pê de li Siwîsrayê

modêla çareserîya berfireh ya nerazîbûnê were bikaranîn, ev tê wê wateyê: eger kesekê/î hê dema ew zindî, negotibe yan nenivîsandibe, ku ew naxwaze endam û şaneyên laşê xwe bibexşîne, bi giştî her kesek wek bexşandera/ê endam û şaneyên laş tê hisabkirin. Eger kesekê/î daxwazîya xwe li dema hê ew zindî tomar nekiribe, mirovên wê/î biryarê didin, helbet li gorî daxwazîya texmînkirî ya wê/wî kesa/ê mirî. Eger kesekê/î daxwazîya xwe tomar nekiribe û eger mirov nikaribe peywendîyê bi mirovên wê/wî re bike, wî çaxî çênabe endam û şaneyên laşê wê/wî werin derxistin.

Bexşandina endam û şane û xaneyên laş bê pere ne; bazirganîya bi wan qedexe ye.

## 12. Piştgirîya li dema mirinê

Me hemûyan maf ji bo dawîyeke bi rûmet û aram ya jîyanê heye. Divê nexweş di qonaxa dawî ya jîyana xwe de wê dermankirin û piştgirîyê bistînin, ku ji alîyê bijîşkî ve dirust be û li gorî daxwazî û pêdivîyên kesên elaqedar be. Armanca wan, parastin û başkirina xweşîya jîyanê, heta roja dawî ji emrê mirovan e.

Mirovên li qonaxa dawîya jîyana xwe mafê wergirtina çavdêrîya bermirinê, anku wekî sivikkirina dîyardeyan û êşan, çavdêrîyeke baş û eger xwestek hebe, herwisa piştevanîyeke bikêrhatî ya derûnî, civakî û rûhî heye. Herwiha, li dema ew diçin seredana cihên xizmetguzarîya tendirustî wan maf heye, ku kesek bi wan re here wan cihan.


## 13. Erkên nexweşan

Te wek keseke/î nexweş maf hene, lê belê di heman demê de erk jî hene, wek nimûne pabendîya bi dermankirina hatîye destnîşankirin û agahdarkirina wan kesên pisporên tendirustîyê li ser tiştên giring yên girêdayî bi tendirustîya te. Cîbecêkirina van erkan bi şêweyekî bingehîn piştgirîya başîya dermankirina te dike.

Ji ber beşdarîya te ya çalak, ku cihê sipasîyê ye û li ser danûstandinê û bawerîya dualî û rêzgirtinê avakirîye, ew kesên pispor yên beşê tendirustî û civakî dikarin dermankirineke wisa pêşkêşî te bikin, ku heta radeyeke gelekî bilind li gorî nirx û daxwazîyên te bin.

## Tu dixwazî bihtir agahdarîyan bistînî, alîkarî ji bo te pêdivî ye yan pêdivîya te bi şîretkirinê heye?

Daxwazîya belavoka me ya berfireh «Kurtasîyek li ser mafên nexweşan» bike yan jî berê xwe bide rêvebirîya tendirustîyê ya Kantona xwe:



**Tedbîreke kantona Bernê, Freiburgê, Genfê, Jurayê, Neuenburgê, Tessinê, Waadtê û Waliisê.**